

Biryara Serok Barzanî bi çûna Pêşmerge bo Kobanê dîrokî bû

Kurdistan



Roja 222014/10/an, Parlamentoya Kurdistanê li ser daxwaza Serok Barzanî, ji bo gotûbêjkirina rewşa Kobanê civiya. Di civînê de, Parlemantoya Kurdistanê bi koma dangan daxwaza Serok Barzanî ya ji bo şandina Pêşmergeyan bo Kobanî û alîkariya

Kurdên Kurdistanê Sûriyê bi awayekî fermî pejirand. Roja 282014/10/an, yekem karwana hêza Pêşmerge ku hejmara wan 150 Pêşmerge bû, bi çekên sivik û giran bi 40 otomobîlên leşkerî ber bi Kobanê ve bi rê ket û bi dirêjahiya rê ji Başûr, Bakur û heta gihîştina Kurdistanê Sûriyê,

welatîyên Kurd bi ala Kurdistanê, sirûda niştimanî, çepik û tilîliyan pêşwazî li hêza Pêşmerge kirin, ji ber ku bi nêrîna Kurdên her çar perçeyên Kurdistanê, şandina hêza Pêşmerge bo Kobanê, bûyereke dîrokî bû. Bi gihîştina hêza Pêşmerge re, balansa şer hat guhartin û di demekê

de ku tenê ji sedî 20 ji Kobanê destê Kurdan de mabû, Pêşmerge û hêzên li wê deverê rûbirûbûyî DAIŞê bûn. Girê Kaniya Kurdan û taxa Meştel ku dawî xala rojhilatê bajêr bû, ji destê çekdarên DAIŞê derbixin û piştê navenda bajêr jî bi temamî ji DAIŞê pak bikin û Kobanê ji metirsiya

ketinê rizgar bikin. Fêsel Omer ku xelkê Kobanê ye wiha dibêje, biryara Serok Barzanî nayê jibîr kirin û ev helwest li cem her Kurdekî cihê serfirazî û şehnazîyê ye, û divê di pirtûkan de were xwendin, bi rastî biryareke dîrokî bû. Cemîl Biro jî wiha dibêje, heta niha jî ez matmayî dimînin dema ew

roj tê bîra min bê çawa Pêşmerge di nava xaka Bakurê Kurdistanê derbas bûn û xwe gihandin Kobanê, ev yek li dîroka zêrîn ya Serok Barzanî zêde dibe, ew rêvberê hemû Kurdan e, heger ew neba Kobanê dihate dagîrkirin.

Divê li Efrînê rêgirî li bînpêkirinan were kirin

Kurdistan-
Elî Xidir

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) bi daxuyaniyekê ragihand: "ENKS kiryarên hovane yên li Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê dibin bi tundî şermezar dike û daxwazê ji Tirkîye û welatên pêwendîdar bi dosya Sûriyê û rêxistinên mirovî û yasayî dike, bi berpirsiyariyên xwe yên exlaqî û yasayî rabin û sînoreke ji van kiryarên ku digihin asta tawanên şer deynin."

ENKSê di daxuyaniya xwe de diyar kir: "Bi hatina werzê çinîna zeytûnan re, bînpêkirinên grûpên çekdaran ji dizî, talan û ferzkirina bacên giran li ser welatiyan gelekî zêde bûye, bi taybetî li ser cotkaran ku grûpa Abû Emşê baca ji sedî 25 daniye ser berhema zeytûnan ku bi vê baca giran re, cotkar di zewiyê xwe de bûne wek kole." Herwiha destnîşan kir: "Ev yek di demekê de tê kirin, bînpêkirinên din wek revandin, eşkerekirin û kuştina welatiyan û proseya guhartina demografi berdeham in. Heta koçberên vegeyane ser cih û warên xwe jî rastî lêpirsîn û binçavkirinê tên, ji bo ew careke din koçber bibin, bêyî ku ti sînorek ji van bînpêkirinan werin danîn."

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) eşkere dike: "Hevpeymanîya Niştimanî ya Operasyona Sûriyê (Îtîlaf) ya ku ev grûpên çekdaran wê ji xwe re wek sîwan dibîne, rêkeftina ku bi ENKSê re, ya derbarê rawestandina bînpêkirinan û cezakirina tawanbaran û rêxweşkirina ji bo vegera koçberan û rawestandina proseya guhartina demografi de îmze kiriye, bi cih neaniye."



ENKS eşkere dike: "Ev bînpêkirinên li Efrînê tên kirin, ligel teqînên ku her demekê rû didin û sivilî tê de dibin qurbanî, rewşa jiyanê gelek zehmet kiriye. ENKS van kiryarên hovane yên li Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê dibin bi tundî şermezar dike û daxwazê ji Tirkîye û welatên pêwendîdar bi dosya Sûriyê û rêxistinên mirovî û yasayî dike, bi berpirsiyariyên xwe yên exlaqî û yasayî rabin û sînoreke ji van kiryarên ku digihin asta tawanên şer deynin. Herwiha ENKSê daxwaz dike, grûpên çekdaran ji navçeyên sivilan bêne

derxistin, bînpêkirin û dastdanîna ser mal û milkê xelkê werin rawestandî û îdareya herêmê ji bo xelkê wê were radestkirin." Li Efrînê, grûpeke çekdar berhemên 17 hezar darên zeytûnan li nahiyeya Bilbilê jinav birin. Li herêma Efrînê, nêzîkî 19 milyon darzeytûn hene ku dike %20 ji darzeytûnên Sûriyê. Salane nêzîkî 55.000 ton zeyt berhem didin. Ji dema dagîrkirina Efrînê ve, nêzîkî 700.000 darzeytûn û darên fêkî bi destê grûpên çekdar û kesûkarên wan ên hawirde hatine birîn û şewitandin. Herî dawî, di

meha Îlona borî de, 205 darzeytûn hatine birîn. Mihemed Ehemd lis er vê mijarê wiha ji rojnameya Kurdistan re dibêje, daxuyaniya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) lis er Efrînê tiştêkî baş e û di cih û demeke guncayî de hatiye, pêwîste Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) bi cidî li ser bînpêkirinên ku li Efrîn û Serêkaniyê raweste, û êdî dengê xwe bighêne aliyên peywendîdar, divê ew komîteya di navbera wê û Îtîlafê de pêk hatibû were aktîvkirin, û ev bînpêkirin werin rawestandî, herwiha divê ji Tirkîyê

jî bixwaze bi cidî li ser vê mijarê raweste û nehêle bînpêkirin zêde bibin, ji ber ku hebûna bînpêkirina nahêle xelkê Efrînê vegeyane ser mal û milkên xwe ku niha li kampên devera Şehba dijî û di rewşeke xerab de ne. Cemîl Ezîz jî wiha dibêje, Heger hat û rêgirî li van bînpêkirina were kirin tekez dê hejmareke zêde ya xelkê Efrînê vegeyane ser mal û milkên xwe ji ber hebûn aramiyê dê alîkar be ji bo vegera xelkê. Herwiha nabe dar û zeytûn û qûtên xelkê were dizîn, lewma divê çareseriyêke temam were kirin.

Encûmena Niştîmaniya Kurdî..

10 sal ji kar û xebata berdewam

Kurdistan

Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) bi boneya derbasbûna 10 salan di ser damezirandina wê re, tekeziyê li ser pabendbûna xwe bi armancên neteweyî û niştîmanî û berdewamiya tekoşîna xwe ji bo bidestana wan dike. Sekreteriya Giştî ya ENKSê bi vê boneyê daxuyaniyek belav kir û tê de ragihand, ENKS di qonaxê girîng a dîroka vê herêmê de hate damezirandin ku tê de gelek tevgerên cewawerî li dijî rêjîmên dîktatorî rabûn, ev tevger ber bi Sûriyê ve çû û bû şoreşek ku dixwest rejîmê biguhere û dawî li stema ku bi dehan salan li ser gelê Sûriyê dihat kirin bîne. Li gorî pêşhatên bilez, tevgera niştîmanî ya Kurdî tekoşîn û nêrînên xwe bike yek û Encûmena Niştîmanî ya Kurd wek hevberdiyêke siyasî damezirîne ku piraniya partiyên kurdî, hevrêziya ciwanan, rêxistinên jinan û çalakiyên civakî û çandî yê gelê Kurd di nav wê de cih girtin. ENKS di daxuyaniya xwe de dibêje: "Encûmenê hemû şewazên tekoşîna demokratîk ji bo bidestxistina bernameya xwe pejiwand, hewl da ku yekrêziya kurdî pêk bîne û nêrîna xwe ji bo Sûriyê diyar kir ku pêwîst e dewleteke federal, demokrat, secular, pir-netewe û pir-olî be û destûra wê mafên neteweyî yê gelê Kurd li Sûriyê û mafên pêkhatiyên din yê niştîmanî nas dike." Hekez kir jî: "ENKS bijardeya ewlehî û leşkerî ya rejîmê di rûbirûbûna krîzê de şermezar kir û çareseriya siyasî wek bijardeya herî guncaw ji bo derketina ji bazneya tundûtûjî, kuştin û wêrankirinê dibîne. ENKS ji bo bibe beşek ji çareserî û hevkarîyê û beşdar be di diyarkirina



pêşeroja Sûriyê de, kar bi hêzên opozîsyonê yê niştîmanî re kar kir û di sala 2013an de tevli Hevpeymanîya Niştîmanî ya Hêzên Şoreşê û Rikberîya Sûriyê bû, li ser bingeha belgeyê ku tê de nasnameya niştîmanî ya gelê Kurd li Sûriyê û mafên wî yê niştîmanî hat naskirin." Destnîşan kir jî: "ENKS di çarçoveya şanda Hevpeymanîyê de beşdarî kongirên Cenêvê bû, herwiha weke yek ji pêkhatiyên Desteya Danûstandinan beşdarî kongreya Riyad 2 û Komîteya Destûrî bû. ENKS li aliyê her hewleke siyasî ya navdewletî ye ku dawî li stemkariyê bi hemû stûnên wê bîne û armancên gelê Sûriyê di azadî û rûmetê de pêk bîne." Di daxuyaniya ENKSê de hat gotin: "Derbasbûna hêzên Tirkiyê û grûpên çekdar ên ser bi wan ve bo Efrînê di sala 2018an de û Serêkaniyê û Girê Spî di sala 2019an de, barê ENKSê li hember pêla koçberiyê û êş û azarên koçberan zêde

kir, ev yek ji bilî tawan û bînpêkirinên gelek komên çekdar ên di derheqê kesên ku li ser xaka mane û karê wan ê guhartina demografiya herêmên Kurdî." ENKS di daxuyaniya xwe de tekez dike: "ENKS li hember eşkerekirina van bînpêkirinan ranewestîya, civaka navdewletî xiste pêş wêneya trajedîk ya xelkê wan deveran û jê daxwaz kir ku berpirsiyariya xwe di rawestandina van tawanên de bigire ser milê xwe û kar ji bo asankirina vegera koçber û derbideran bo malên xwe, dabînkirina pêdiviyên jiyanê ji wan re, derxistina komên çekdar ji navçeyên niştîmanî û radestkirina rêveberîya wan deveran ji bo niştîmanîyê xwe yê resen bike." Derbarê yekrêziya navmala Kurdî de ENKS diyar dike: "ENKSê ji ber pêwîstiya qonaxê û daxwazên gelê yekrêziya Kurdî, razî bû ku bi PYDê û aliyên wê yê hevalbend (PYNK) re bikeve danûstandinan, Tevî talbûna ezmûnên

berê yê ENKSê pê re û têkçûna peymanên Hewler û Duhokê yê di bin sîwana Serok Mesûd Barzanî de hatine kirin û tevî kiryarên wê (PYD) yê tepeserkirin û tirsonek li dijî ENKSê û alîgirên wê." Herwiha got: "Di van danûstandinan de rêkeftina Duhokê wek bingeh ji bo wê hat dînin û bi serperîştîya Amerîka û garantiya ji serkirdayetiya HSDê ya pabendkirina PYDê bi cîbicîkirina rêkeftinê, peydakirina atmosfereke erênî ji bo çalakiyên siyasî û redkirina sîno-darkirina karê ENKSê û girtina hevalên wê dihatin kirin. Di mehên destpêkê de, li ser dosyayên girîng ên wekî "Nêrîna Siyasî ya Hevpar" û avakirina "Lêvegera bilind a Kurdî" hat lihevkerin." Destnîşan kir jî: "Tevî ku ev danûstandin hîna gelek dosya li pêş wê ne û pêwîstiya wan bi çareseriyê hene, lê belê PYDê û dezgehên wê yê ewlekariyê bi armanca têkbirina wê, êrîşî ser ofîsên

ENKSê kirin, kadroyên wê girtin û lêpîrsîn bi endamên wê û malbatên Pêşmergeyên Roj re kirin û daxuyaniyên medyayî yê xiyankariyê li dijî ENKSê avêtin. Ji ber vê yekê, daxwaz ji aliyên gerentîkat û serkirdayetiya HSDê dike ku kar ji bo rawestandina van bînpêkirinan û dubarenebûna wan bikin û belgeyên garantiyê yê ku wan soz dabûn wek destpêkekê ji bo berdewamkirina danûstandinan, bi cih bînin." ENKSê diyar kir: "Ji bo xurtkirina rola niştîmanî ya ENKSê, bi Tevera El-Xed a Sûriyê û Rêxistina Asûrî ya Demokratîk re Bereya Aştî û Azadiyê ava kir, weke çarçoveyek vekirî ji hemû hêzên niştîmanî yê opozîsyonê re ku baweriya wan bi çareseriya siyasî, çalakiyên demokratîk û hevparîya rasteqîne di xêzkirin û diyarkirina çarenivîsa welat de li gorî nêrînekê ku biryarên rewatiya navdewletî qebûl dike, bi taybet jî biryara 2254. Li ser rol û piştvanîya Serok Barzanî, Herêma Kurdistanê û serkirdatiya wê ya siyasî ji gelê Kurd ê Rojavayê Kurdîtanê re, ENKSê got: "Di vê boneyê de, ENKS spasiya cenabê Serok Mesûd Barzanî û serkirdayetiya û hikûmeta Herêma Kurdistanê dike, ji bo wan alîkariyên ku pêşkêşî gelê Kurd li Sûriyê di kêşeya wan de kirine. Ew hertim baştirîn piştgir ji doza gelê Kurd a netewî bûn û di piştvanîkirina xebata ENKSê de jî ti carî xemsar nebûn." ENKSê di dawîya daxuyaniya xwe de got: "ENKS û ew dikeve dehsaliya xwe ya duyemîn, pabendbûna xwe bi armancên neteweyî û niştîmanî yê ji xwe re danîbûn, nû dike, tekezî li ser berdewamiya tekoşîna xwe ji bo bidestana wan dike û rê nade ku zehmetî û astengî xebata wê rawestîne."

Berdewamiya bilindkirina nirxan û bandora wê li ser aboriya Kurdistanana Sûriyê

Hêvî Delî- Qamişlo

Li kurdistanana Sûriyê rewşa aborî ya zehmet êdî bûye sedema sereke ji hejarî û belengaziya welatiyan ji vê yekê alozî û astengiyên welatî dibînin ji aliyê kêmbûna peydakirina xizmetguzarî û xwestekên jiyana mirov ya rojana de ji bûhabûna nirxê hemû alav û kelûpel û kerestên xwarinê û bê goman ev yek bandoreke neyînî li ser jiyana xelkê dike ..

Û herwiha ji bilî vê bilindbûna nirxê pêdeviyên gerek û sereke yê jiyane weku elektrîk û nan û derman bû cihê nerazîbûna

hemwelatiyan..
Û di derbarî vê babetê de welatiyê bi navê " Ehmed Ibrahîm " wiha anî ziman: Ku kirîza bilindbûna nirxê derman û tunebûna gelek cureyên wan li dermanxaneyan li kurdistanana Sûriyê bûye cihê pirsgirêkê li gel hemwelatiyan, de ku piraniya dermênên nexwaşiyên giran peyda nabin û heger peyda bibe jî bi nirxekî bûha tê firotin û êdî neçar dibin bi giranî bikirin ...

Û ji rexekî di ve çarçoveya rûbirûbûna astengiyên welatî dibînin li seranserî herêmên kurdî derbarî bilindkirina kerestên pêwîst ên jiyane ku ji

sedema rûxandina lêreya Sûrî li beramberî dolarê Amerîkî bandorê li ser kirîn û firotinê di nava bazarê de dike û her tişt bûha dibe ji vê yekê xelk li kurdistanana Sûriyê bi zehmetî pêdeviyên rojana bi destdixin û nexasim ku kesên karê rojana dikin û bê mûçene û dibin hêla hejariyê de dijîn ...
Û her berdewamiya ser vê mijara aloziyên hemwelatî tede derbas dibin ji aliyê rewşa elektrîkê ..

Welatiyek bi navê " Ferhad Reşîd " wiha amaje pê kir : ji destpêka kirîza Sûriyê ta niha elektrîka niştîmanî gelek xirabe , û her li taxakê di nava bajêr de



jenaretorên taybet hatine danîn û her demekê nirxê empêran bûha dikin û ev yek dibe berakî giran ser milê hejaran ..
Û herwiha hêjaya were

gotin ku ji destpêka kirîza Sûriyê ta niha roj bi roj rêjaya hejariyê li kurdistanana Sûriyê zêde dibe û xelk di rewşeke metirsîdar de dijîn ...

37 sal bi ser koça dawiyê ya Cegerxwîn re derbas dibin



Kurdistan-Bidûvçûn

Roja 22ê Cotmeha sala 1984an li Stocholmê Paytexta Siwêd, nivîskar û Helbestvanê kurd ê navdar Cegerxwîn koça dawiyê kiribû. Seydayê Cegerxwîn li pişt xwe berhemeke dewlemend ji helbest, ferheng û çirokan hişt. Cegerxwîn jiyana xwe di nava wêje û siyasê de derbas kir. Ji ber karê xwe yê siyasî jî, çend caran ji rojavayê Kurdistanê derketiye.

Sala hezar û nehsed û sê ez hatim dinyayê Bi navê Siltan Şêxmûs ez çêbûme ji dayê Heta bûm sêzde salî li gundê me'y Hesarê Jîna xwe min diborand, paşê ji wê me da rê Seyda Cegerxwîn di wêjeya kurdî de xwediyê roleke mezin bû. Bi mamosteyê edebiyata kurdî jî hatiye binavkirin. Di sala 1920an li dibistana olperestî

xwend û ji bo xwendinê, çend salan li Kurdistanana Iraq, Kurdistanana Îran û Kurdistanana Sûriyê geriyaya û ji nêzik ve rewşa milletê kurd li parçeyên Kurdistanê şopand.

Seyda li sala 1927'an jiyana hevjinîyê ligel keça xalê xwe pêk anî û li Amûdê bicih bibûn. Sala 1928 yekem dîwana xwe nivîsand ku tê de behsa jiyana xwe jî kir. Cegerxwîn û hevalên xwe li sala 1937-1938-'an komeleya ciwanan li bajarê Amûdê vekirin, lê wê demê fransiyan girt. Sala 1946an Cegerxwîn mala xwe bir Qamişlo û dest bi jiyana siyasî kir û bi komeleya Xweybûn re kar kir. Di wê salê de bi hevalên xwe re Civata Azadî û Yekîtiya Kurd avakirin. Dr. Ehmed Nafiz serok wê bû û Cegerxwîn jî sekreterê wê bû. Seyda ji sala 1946 heta sala 1973 jiyana xwe

di navbera Kurdistanana Sûriyê, Kurdistanana Iraqê û Libnanê de derbas kir. Gelek caran ji ber kar û xebata xwe ya siyasî, ji aliyê rijîma Sûriyê ve hatiye girtin. Ji ber gufaşên zêde yê desthilata Sûriyê, neçar ma di sala 1979an de koçî welatê Siwêdê bibe û jiyana xwe li wir derbas bike.

Kîme ez?
Kurdê Kurdistan
Tev şoreş û volqan
Tev dînamêt im
Agir û pet im
Sor im wek etûn
Agir giha qepsûn
Gava biteqim
Dinya dihejî
Ev pêt û agir
Dijmin dikuji
Kîme ez?
Ez im rojhilat
Tev birc û ketat
Tev bajar û gund
Tev zmar û lat
Ji destê dijmin:
Dijminê xwînwar
Xurt û koledar
Ji rom, ji fireng
Di rojên pir teng
Bi kuştin û ceng
Parast, parast
Parast min ev rojhilat
Kîme ez?
Rojhilatê nêzik
Rojhilatê navî
Ev bajar û gund
Ev bej û avî
Ket bin destê min

Pî da ser dijmin
Min bi ceng û şer
Zanîn û hiner
Pişt wî şikand
Serî lê gerand
Ez bûm padîşah
Xurt û serbilind
Ketm destê min ta sînorê
Hind Kîme ez?
Kîme ez?
Cegerxwîn roja 22
Cotmeha sala 1984an
li Stocholmê koça
dawiyê kir û li pişt xwe
berhemeke dewlemend
ku ji 8 dîwanên helbestê
û 11 pirtûkên ku
behsa dîrok û ferhenga
kurdan dike pêk tê, li
pişt xwe hişt. Herweha
nêzikî 29 pirtûkên wî
yên din jî hene, lê hîn
nehatine çapkirin. Gelek
hunermendên kurd
helbestên wî kirine sitran,
ya herî bi navûdeng jî "Kî
Me Ez" ku hunermend
Şivan Perwer straye.
Helbestvanê mezin
Cegerxwîn di jiyana xwe
de li ser gelek tiştan
rawestiye û nivîsiye. Bang
û hawarên wî her tim
ji bo yekîtiya kurdan û
azadiya Kurdistanê bûn.
Di helbestên xwe de behsa
her tiştî kiriye, ziman,
dayik, welat, jin, jiyana,
evîn, xebat û têkoşinê û li
ser hejar û dewlemendan
jî nivîsanisye. Lewma
gotin û helbestên wî li ser
zimanê her kurdekî ne.

Pêşde Here



Hiyam Ebdulrehman

Şêrin li meydanê şera
Ne mîna çeqel û gura
Digirin koz û çepera
Kurd mirovek xo
ragira
Lidastanên va şerkera
Cenga mêrxas û
leşkera
Xwe dane ber top û
bera
Serkeftî her misokera
Bizendê van têkoşera
Nevyê qadiyê çar çira
Pasevan û xo ragira
Hezar aferîn ji tera
Xo na firoştin bi Pera
Hêz ji Hasin û kevira
Pêşmerge Taca li sera
we neyar xistin Agira
Çendî dijmin hewlda
bira
Bi top û bi balafira
Ne şiya Wan bikê qira
Jiber Pêşmerge bivira
bi viyana xwe bawera
Pêşde here pêşde hera
Serxwebûnî me li bera